Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1159 | 10-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

Bexçeyên Rêber Apo li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Lîloz Hisên/Qamişlo

Rojbûna Rêber Abdullah Ocalan ji bo gelên azadîxwaz bû tava rojê. Bi boneya Rojbûna Rêber Apo her sal li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bexçeyên bi navê Rêber Apo tên vekirin û heta niha hijmara wan gihiştiye 23 bexçeyan.

Roja 4`ê Nîsanê rojbûna Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan e, bi vê boneyê gelek çalakî, şahî û semînerên cuda û bernameyên ciwanan li tevahî herêmê tên li darxistin herwiha dar û cureyên gulan li hemû Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên çandin.

Yek ji pernesîbên Rêber Abullah Ocalan parastina Ekolojiyê bû

Di rojbûna Rêber Abdullah Ocalan de dar tên çandin û baxçe tên vekirin ji ber ku Rêber Apo giringiyeke dabû xwezayê û digot; ku ez di rojbûna xwe de dixwazim tenê daran biçînim, bi vê boneyê dar tên çandin ji ber ku wî pir ji xwezayê hez dikir. Herwiha felsefeya wî li ser sê xalên bingehîn e(Demokratî, Azadiya jinê û parastina Ekolojîk) bû. Girêdaneke mezin di navbera Rêber Abdullah Ocalan û Ekolojiyê hebû, di riya wî ya têkoşînê de yek ji pernesîbên wî parastina ekolojiyê bû.

23 bexçeyên Rêber Apo hatine vekirin

Di seranserî 8 salan de piştî şoreşa 19`ê tîrmehê 2012`an baxçeyên bi navê Rêber Abdullah Ocelan hatin vekirin tê de gul û dar hatin çandin. Di navbera salên 2015 û 2023'an de ji Heleb heta Dêrikê li 23 deveran Baxçeyên Rêber Apo hatine vekirin. Wekî li Heleb, Şehba, Kobanê, Minbic, Tebqa, Reqa, Hesekê, Şedadê, Hol, Til Temir, Zirgan, Til Birak, Til Hemîs, Amûdê, Qamişlo, Tirbesipiyê, Girkê Legê, Dêrik û Til Koçer hatine vekirin. Li tevahî baxçeyên ku hatine vekirin cureyên ji gul û daran hatin çandin vê yekê xemleke rengîn da bajar û bajarokan. Di baxçeyan de odeyên xwendinê hatin avakirin û pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan ku bi zimanê Kurdî û Erebî hatine amadekirin, gelek pirtûkên cur bi cur hene. Herwiha cihê rûniştinê û bernameyên hunerî jî hat amadekirin.
Baxçeyên Rêber Apo roleke mezin di pêşxistina civakê de lîst, tevahiya pêkhateyên herêmê serdana baxçeyan dikin, malbat tên baxçeyan da ku bêhna xwe bidin ku bûye weke derfet da ku ji zehmetiyên jiyanê dûrbikevin ji ber ku xweza kêfxweşiyê dixe nava dilê mirov de û bandoreke erênî li ser derûniya wan dike û bi hevalan re suhbet û nîqaş tê kirin da ku têkiliyên di navbera wan de xurtir bibe, di heman demê de jî zarok tê de dibînin weke ciheke fireh ji bo lîstinê û valakirina enerjiya wan herwiha têkiliyên zarokan bi civakê û xwezayê xurtir dike. Di 4'ê Nîsana 2024'an de jî li Kantona Tebqa, navçeya Çîlaxa û bajaroka Girbawî yên Qamişlo baxçeyên nû hatin vekirin.

Keça Necîb Mehfûz pirtûkxaneya bavê xwe diyarî kir

Keça wêjevanê misrî Necîb Mehfûz Um Kelsûm pirtûxaneya bavê xwe diyarî pirtûxaneya Skenderiyeyê kir.
Gerînendeyê Pirtûxaneya Skenderiyeyê Ehmed Zayid ragihand ku pirtûxaneya wêjevanê ji Misirê Necîb Mehfûz diyarî Pirtûxaneya Skenderiyeyê hatiye kirin û derdora hezar û 500 pirtûk û ferhengên bi zimanên cuda tê de hene.
Zayid diyar kir ku di nava pirtûkan de, bawername, wesîqe, wêneyên kesayetî, kasêtên roman û nivîsên Necîb Mehfûz hene.
Di Pirtûkxaneya Skenderiyeyê de bi dehan pirtûxaneyên taybet ên siyasetmedar, ronakbîr, wêjevanên mîna sekreterê giştî yê NY`yê yê berê Butrus Xalî, rojnamevanê nemir Mihemed Hesenên Heykel û Ebdulrezaq El Senhûrî hene.

88 hezar berhem bêyî pere!

Muzeya bi navê "The Getty" ku navenda wê li Los Angelesê ye hewl dide berhemên hunerî û çandî biparêze û bi awayekî bê pere nîşanî xelkê bide. The Getty ragihand ku wan ji koleksiyona xwe 88 hezar berhem bi awayekî online ji xekê re vekiriye û xelk dikare bi qelîteyeke baş van berheman bibîne bêyî ku pereyekî bide.
The Getty di derheqê berhemên ku weke berhemên qamûyî parve kiriye de got; "Kesên serdana malpêrê dikin dikarin hemû berhemên bi qelîte bêyî destûreke fermî daxînin, li ser bilîzin û ji nûve bisêwirînin."
Ji ber ku berhem gelek zêde ne muze ji bo ziyaretvanan platforme lêgerînekê jî ava kiriye û xelk bi rehetî dikare li navê hunermendan bigere û bi vî awayî xwe bigihîne tabloyên wan. Muzeya The Getty da zanîn ku ew ê di vî warî de xebatên berfirehtir pêk bînin û bi çavkaniyên nû dîsa derkevin pêşberî xelkê û berhemên hunerî bi xelkê re parve bikin.

Sudoku: Bersiv 71

8	2	1	6	4	3	9	7	5
3	6	5	9	7	2	1	4	8
9	7	4	1	5	8	3	6	2
7	5	6	4	2	1	8	9	3
1	3	2	8	9	6	7	5	4
4	8	9	5	3	7	6	2	1
6	4	7	3	8	5	2	1	9
5	1	8	2	6	9	4	3	7
2	9	3	7	1	4	5	8	6

Sudoku:Pirs 72

5	8							9
2	1			6				
	7	6			3	4	5	1
						9		
3			4	2	5			7
		1						
7	9	8	3			2	4	
				4			9	8
1							7	6

FERHENGA BIWÊJAN

Rojê heft xesûyan dixeniqîne, bi şev ji qurquroneka dêrî ditirse:
- Sêhrekiyan dike; derewan dike; bi zanebûn xwe wisa nîşan dide; metrebaz e.
Rûyê reş û spî wê ji hev kifş bibin:
- Ka kî derewan dike, kî rast dibêje wê diyar bibe.
Serê wî bi ard ji aş bê, ti kes jê bawer nake:
- Ne yê baweriyê ye; baweriya ti kesî pê nayê; pir derewan dike.
Stirhên derewînan şîn nabin:
- Derewên te pir eşkere ne; derewên te pir mezin in; tu pir derewan dikî.
Şahidê mino dûvikê mino:
- Şahidê wî amade ye; şahidê wî pê re ye; çi dibêje hevalê wî erê dike.
Şape bi ser hev de berdan:
- Derewên pir mezin kirin.
Şaqolê wî şkest:
- Derewa wî derket hole.
Şaqolê wî xwar bû:
- Bi heman wateyê.
Tûrikê derewînan qul e:
- Derew zû eşkere dibin.
Xirê xwe bi paçikan mezin dike:
- Bi derewan pesnê mêraniya xwe dide.
Xwe berda:
- Dest bi derewan kir.
Xwedê heye:
- Mirov derewan bike nebaş e; divê mirov li paş hina rast biaxive.
Yekê heft xesû xeniqandibûn ji biqebiqa devê cêr ditirsiya:
- Sêhrekiyan dike; derewan dike; bi zanebûn xwe wisa nîşan dide; metrebaz e.

LI SER KAR, XWESTEK YAN JÎ GOTINÊN BÊWATE Û NE DI CÎ DE
Bav ji êş tê kur pirsa bajêr jê dike:
- Tiştên bêwate dibêje; hişê wî li devereke din e; nizane ka çi dibêje.
Bav ji êş tê, kur qisetan dike:
- Dema haya yekî ji bûyerekê, tiştekê hebe, lê yê ku baş nizane behsê dike, hingê jê re tê gotin.
Bûye çiraya ber koran:
- Karekî bêwate ye; karekî pûç e; ti faydeya wê nemaye.
Bûye defa ber keran:
- Bi heman wateyê.
Cê berdin ser cê, gênim berdin ser gênim:
- Dema mirovek bi kêrî tiştekî neyê, lê berpirs be û sirf gotinên berpirsên ser xwe re pêk bîne, hingê tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

'Bi cesareta ku min ji Rêber Apo girtiye ez jiyan dikim'

Bi Rojbûna Rêber Apo re, zayîna jiyaneke nû li ser xaka Kurdistanê vejîn bû. Navê vejîn bû. Di rastiya gelekî ku li ber pença qirkirinê bû, hêza wateyê û jiyana bi rûmet afirand. Dayika bi navê Sûreya Hebeş diyar kir ku ew bi fikrê Rêber Apo bû aşiqa azadiyê.**R-6**

'Îradeya Gelan wê dawiya desthilatdariya faşîst ya Erdagan bîne'

Hêzên hegemonîk ji bo berjewndiyên xwe siyasetên qirkirinê li ser gelên Rojhilata Navîn didin meşandin. Dewleat Tirk jî di pêkanîna van siyasetan de xwedî roleke sereke ye. Endamê Meclîsa Giştî ya PYD'ê Esaed Menan anî ziman ku hilbijartinên herêmî planên Erdogan têk bir.**R-4**

Jineolojî (zanista jiyanê)

Jinelojî, wek navê 'zanista jinê' yekem car di sala 2008'an de ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve hat pêşniyarkirin. Abdullah Ocalan di pirtûka xwe ya bi navê "Civaknasiya azadiyê" de anî ser ziman.**R-2**

Xelîl Dag bi heskirin û bawerî nêzî karê xwe dibû

Jina Şoreşger Jinda Asmen da zanîn ku şehîd Xelîl Dax di sala 1995'an de biryara kişandina fîlmên sînema da û wiha got, "Dema mirov dibêjin Xelîl Dag Çiya tên bîra me. Xelîl Dag bi dispilîn, moral û bawerî nêzî karê xwe dibû, dema karek dida meşandin bi her tiştên xwe tevlî wî karî dibû.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1159 | 10-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

GELÊN BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ BI YEKDENGÎ AZADIYA RÊBER APO XWESTIN

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdarbûna xwe ya girseyî di Kampaniya Komkirina Îmzeyan de ku di 9'ê Sibatê de ji aliyê Însiyatîfa Gel a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve hatibû destpêkirin û di 4'ê Nîsanê de di Roja Rojbûna Rêber Apo bi dawî bû, peyam dan tevahî hêzên komploger ku ew ê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têkoşînê dewam bikin.**R-3**

'Kurdên Bakurê Kurdistanê di hilbijartinan de hebûna xwe isbat kirin'

Sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Fewzî Şengalî da zanîn ku kurdan di hilbijartinên şaredariyên Bakur û Tirkiyê de tevî hemû zehmetiyan bi vîneke mezin xwe isbat kirin.**R-5**

Bi rêbazê rejimkirinê jin tê qirkirin — Nehîr pale — R-2
Ihtîmala êrişan mezin e, baldarî pêwiste! — Dilyar Cizîrî — R-4
Kodên şikandina bêdengiyê — Farûk Sakik — R-5
Tengezariyên Erdogan — Zekî Bedran — R-5
Wêjeya pabend berpirsyarî ye ne alîgirî — Kemal Necim — R-7

Jineolojî (zanista jiyanê)

Jineolojî, wek navê ‘zanista jinê’ yekem car di sala 2008’an de ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdllah Ocalan ve hat pêşniyarkirin. Abdullah Ocalan di pirtûka xwe ya bi navê “Civaknasiya azadiyê” de anî ser ziman. Di nava 28´ê Sibatê û 2´yê Adara 2014´an de bi care pêşî konferansek bi navê jineolojiyê li zanîngeha Berlînê ji aliyê jinên akademisyen ên kurd û ên cîhanê ve hat li darxistin.

Deriya Çiya/Qamişlo

Jineolojî yekem car di sala 2008’an de ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdllah Ocalan ve di pirtûka sosyolojiya azadî de hat pêşniyarkirin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bivê zanistê diyar dike ku heta jin azad nebe civak jî azad nabe her wiha diyar dike ku azadiya jinan asta azadiya civakê diyar dike. Jineolojî cara ewil di sala 2011’an de rêxistinbûna xwe li çiyayên azad ava dike. Her wiha yekem car konferansa xwe di sala 2015’an de bi tevlibûna 140 delegeyan pêk tîne. Di konferansê de biryar hatibû girtin ku jineolojî şaxên xwe belavî tevahî cîhanê bike û xwe bigihîjîne tevahî jinên cîhanê.

Çima Jineolojî

Pêwîstiya zanista Jineolojî zanisteke erênî ye. Li dijî zîhniyeta seqet û perçebûyî hatiye afirandin. Ji xwe yek ji berhemên ked û hizrandina jinan e. Tiştên nû li jiyanê zêde dike ji bo wê jî qadeke berfireh û zanisteke dewlemend şîrove dike. Zîhniyetên serwer û ji halketî civakê ji hev xistibûn, mirov dikare ji bingeha Jineolojiyê ve sereraskirinekê çêbike û pê re jî civakê vegerîne pergala wê ya rast. Jineolojî bi îdiaya ku bibe zanista jiyanê, zanista jinê, zanista jiyana civakî û zanista hevjiyana azad radibe. Jineolojî xwe dispêrê aliyên hundirîn ên dinyaya jinan û potansiyala ku di cîhana wan de heye ji bo ku derkevin holê û bi mirovahiyê re werin parvekirin dixebite. Li kêlek wê yekê tundiya li dijî jinan, rastiya dagirkerî, biçûkxistina jinan, bîrdoziya ku pê hatiye tunekirin, înkar û qirkirina jinan, li ser van yekan kar dide meşandin. Her wiha armanca Jineolojiyê ew e ku pergala civakî ya dayiksalarî ava bikin, bi rêxistin bikin û bidin meşandin. Jineolojî kesayeta jinan di aliyê, dad, bereket, aştî, bîrkarî, hesabên zirav, eyarkirina dem, jîrekiya analîtîk û hestiyarî de lêkolîn dike. Jineolojî tiştên aîdê jinan ku beriya hezar salan hatine dizîn yek bi yek keşif dike û dibe bersiva çima Jineolojî. Jineolojî çanda fedîkirinê ya ku şaristaniyê di derdora nasnameya jinan de honandiye parçe dike. Jineolojî nirxên jinan veduguherîne rastiyê, zanebûna wan xurt dike, belge dike û jî dîroka jinan re dihêle. Jineolojî di sedsala 21’ê de xwe bi rêxistin kir û hedef dike ku rastiya jinan a ku hatiye tunekirin ronî bike. Jineolojî koletiya ku li ser jinan hatiye ferzkirin ji holê radike û pênaseya wê ya rast derdixîne holê.

Bi zimanê cuda jin

Peyva jinê di Kurdî de bi zaravayî kurmancî “jin, jinik, pîrek, afret. Bi zaravayî zazakî cin, cenî. Bi zaravayî soranî afret tê îfadekirin. Di Kurdî û hin zimanên din de koka peyva “jin” û jiyan, xweza û azadî wekhev e. Bi Kurdî jin, jiyan, şên, giyan, cîhan û cih ji heman kokê tên. Dîsa peyvên jîndar, jîndarî, jînde, zindî û peyvên jin û jiyan ji heman kokê tên. Bi Erebî Mer’a, di heman demê de jiyan “aiş” e. Navê Ayşe ji vê kokê hatiye dariştin. Her wiha heyat jî dîsa peyveke mê ye û navekî jinê ye. Di Erebî de peyva “Nîsa” ku di maneya “Jinan” de ye û peyva “Însan” yanê mirov e. Bi Tirkî kadin. Bi Îranî xwetenhatun. Bi Hûrîkî aşt. Bi Sumerî nîta. Bi Farisî zen. Bi Ermenkî gîn. Bi Rûmî gyme. Bi Almanî fraû. Bi Latînî femîna. Bi Fransizî femîna. Bi Çînî gyn. Bi Yewnanî gyno. Bi Îbranî îşşa te bi karanin.

Ji bo gihîştina raza jiyanê

Mirov û civaka ku wate nede jiyanê û di nava bêwateyê de bifetise pir zehmet e ku bigihîje raza jiyanê. Divê tevî hemû rastiya jiyanê ya bi êş û îşkence mirov ji xwe pirsa “kî ye” bike. Kesên ku vê pirsî jî ji xwe bikin jin bi xwe ne. Loma jineolojî teqez dike jin, xweza û civak her çiqas hatibe kuştin jî wê di dawiyê de bigihîje raza jiyanê ya jinan. Her wiha ji bo gihîştina raza jiyanê girêdana jin, jiyan û civakê esas digre.

Ji bo avakirina hevjiyana azad

Xwezaya jiyanê dualî ye, yek mêr ya din jin e. Ger têkiliyek watedar di navbera her du zayendan de hebe, wê jiyan, xweza, azadî û wekhevî baş û bi xweşî bimeşe û berdewam bike. Her wiha xwezaya jin û mêr hev temam dike. Rewşên van her du zayendan ku ji aliyê desthilatdaran ve ji xwezayên xwe hatine dûrxistin û biyanîkirin. Lêkolîn, sedem û encamên destwerdanên ku hêzên desthilatdar pêk anîne di berpirsyariya Jineolojî de ye. Dîsa her du zayend ku di aliyê azadî û estetîkê de, ji nû ve bigihîjin hev, rêgezên dildariyê bi pêş bixin, berpirsiyarî û îdeaya Jineolojiyê ye. Di heman demê de Jineolojî bi xwe navê bipêşxistina teoriya hevjiyana azad û sosyolojiya wê ye. Pêşxistina sosyolojî û jiyana rast hevjiyana azad bi xwe ye. Her wiha Jineolojî di destpêkê de hevjiyan û têkiliya heyî analîz dike, bi nav dike, çareserî û projeyên wê bi pêş dixe. Di roja me ya îro de bi taybetî mêr, nikare jinê mîna mirovek, dostek, hevsereke jiyanê û hevjiyana ruhî bibîne. Ji ber ku çanda desthilatdariya mêr, jinê mîna bindesta xwe, metîngera xwe, jina xwe, yara xwe û milkê xwe dibîne. Her wiha di roja îro de her du zayend jî di aliyê ruhî de hev qetil dikin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di vê xalê de wiha dibêje: “Divê mirov baş zanibe ku hevjiyana azad bi awayekî civakî hatiye avakirin. Ev civak di navbera mê û nêr de pêk nayê, di navbera jinîtî û mêrîtiya civakî ya avakirî de pêk tê. Divê neyê jibîrkirin ku avabûna hegemonîk her du cînsan jî seqet kirine, têkiliyên di navbera her du zayendan de bi bandor kiriye û weke têkiliya hegemonîk xwe nîşan daye.” Loma îdiaya Jineolojiyê ew e ku beriya her tiştî bi naskirin û watedayîna xwezaya jin û mêr wê jiyanî bike. Loma teoriya hevjiyana azad wê ji bo jineolojiyê bibe yek ji qadên esasî.

Ji bo ronîbûna jinê were avakirin

Bi hezaran salan e ku rastiya jinê di tarîtiyê de hatiye hiştin, ji bo ku di tarîtiyê de bifetise gelek karên qirêj û kiret hatine meşandin. Jineolojî armanc dike ku rastiya jinan a ku hatiye tarîkirin ber bi ronîbûnê ve bibe. Her wiha armanc dike ku zanista jineolojiyê di nava civakê de bi pêş bixe da ku dîroka jinan ber bi ronîbûnê ve biçe. Jineolojî ji bo ku cîhana tarî ya li derdora jinan hatiye honandin, beden, ruh û aqilê wê ber bi ronîbûne ve bibe gelek xebatên kûr dimeşîne. Ji bo qirkirina jinan bisekine û bingeha saxlam a azadiya jinan were avakirin bersiva herî guncaw Jineolojî ye.

DI DÎROKÊ DE BEDELA HERÎ MEZIN JINA DAYE

Jin û zanist bi tena serê xwe xuliqkariyeke civakî ye û karakterê vê xuliqkariyê îfade dike. Ji ber vê jî jineolojî têgîneke resen e. Dîroka berxwedana jinê jî dibe parçeyekî zindî yê jineolojiyê. Ev dîroka berxwedanê xwe dispêre bi hezaran salan. Di dîrokê de yê ku her tim bedelên mezin dane jin in. Bedela herî mezin jî dest danîna ser azadiya wan e. Herhal di dîroka mirovahiyê de ji vê girantir tiştekî din tine. Ligel vê bedela mezin şer, qirkirin, birçîbûn, sirgûn, asîmîlasyon, koletî, çewisandin, destdirêjî, bênasnamebûn bû para jinan. Tenê jinan ev tişt ne jiya, sîstemê bi tevahiya civakê ev hovanetî dan jiyandin. Ji ber vê yekê di sîstema me ya roja îro de hîn girantir berdewam dike. Ji ber vê yekê jineolojî têkoşîna jinan tenê weke mîraseke dîrokî nagire dest. Weke bêndereke bûyeran hat-çû nanirxîne. Têkiliya wê ya bi rojane re datîne û tecrûbeyên di vê mijarê de derketine holê ji xwe re dike hîmê bingehîn. Jineolojî ji dîrokê heta roja îro dibe îfadeya zanist a têkoşîna jinan. Di heman demê de ji bo jinan dibe zemîneke hevpar a têkoşînê.

Ji Pênûsa Jin

Bi rêbazê rejimkirine jin tê qirkirin

Nehîr Pale

Di dîroka 1800 BZ. dibe ku rêbazê rejimkirine destpêkirin didin bikar anîn, ango gelekî kevne û heyanî roja îro tê bi kar anîn. Li gorî lêkolînan herî zêde dibe ku bi derketina Olên yek xwedayî re ev rêbaz hatibe bikar anîn.
Olên Yek Xwedayî ji bo rejmkirine rewa bikin bi exlaq ve dane girêdan. Ol ne tenê bawerî ye. Pêxemberan bi riya ol hewldane ku pirsgirêkên civakî çareser bikin, lê çima rêbazê rejmkirinê bi ol re hatiye bikar anîn û heyanî roja îro berdewam dike. Pêxemberan destûr nedane ku kesek were rejimkirin, lê belê piştî wan destpê kirine dane bikar anîn. Rejmkirin pirsgirêkên civakî tu carî nikare çareser bike.
Rêbazê rejmkirinê ji bo kî û çima tê bikar anîn? Li gorî tişta di zîhniyeta me de dane rûniştandin, jin û mêrên zina dikin bi rejimkirinê têne ceza kirin. Ev jin û mêrên ku wan bi zina sûcdar dikin, divê ji aliyê mêran ve bêne rejmkirin, her mêrek wê kevir bigrin destê xwe û bavêjin wan heyanî ku bimrin. Di rastiyê de bi keviran insan kuştin rêbazekî hovane ye ji ber dûrî exlaq û edaletê ye.
Di dîrokê de jinên ku felsefe û zanist lêkolîn kirine hatine rejimkirin an jî şewtandin. Jinên ku zagonên mêrê destbilatdar qebûlnekirine ew bi gawirtiyê sûcdar kirine û rejim kirine. Gelek caran mêr dikare hevjîna xwe bi zina tewambar bike û ew jin ji aliyê mêran ve were rejimkirin. Ji xwe jina tê rejimkirin layiqî wê nabînin ku cenazeya wê were veşartin an jî kesek ji ber zagon û dorhêla xwe newêrê cenazeya jina hatî rejimkirin, veşêr in. Çeteyên DAIŞ`ê sala 2016`an li Reqayê ku kiribûn peytexta xwe jinek dibin navê zina kiriye, ew rejimkirin. Şêniyên Reqayê kesek amade nebibû, yên amade bibûn çeteyên DAIŞ`ê û malbatên wan bûn. Heyanî 3`ê rojan destûr nedane ku kesek nêzî cenazeya wê bibe. Piştî 3`ê rojan malbata wê tê cenazeya wê digre û vedişêr in.
Civaka Reqayê nikarin vê bûyerê ji bîr bikin, dibe ku kevir negirtine destê xwe û li wê jinê nexistine, lê belê di mejî û dilê xwe de rejimkirina wê jinê nepejirandine û nikarin jibîr bikin. Jin be yan mêr be dema ku buyer tê bîra wan ditirsin û rengê wan tê guhertin.
Li Îranê jî hîna ew rêbazê rejmkirine ji bo jin tê bikar anîn. Li Afxanistanê jin li hemberî Talîban derdikevin meşê û serî hildidin. Herî dawî Talîban biryar girtiye ku dîsa li rêbazê rejimkirine vegere û misoger wê jinên daxwaza mafên xwe dikin wê wan rejm bikin.
Sîstemên desthilatdar dixwazin bi rejimkirina jinekê re hemû jinan di mejî û ruh de bukjin û li gorî xwe wan terbiye bikin. Bi rejmkirinê re tûndiya li ser jinê tê rewa kirin. Mêr bi mentiqê terbiyekirinê tûndiyê li jinê dikin.
Civak vî rêbazê rejmkirinê tucarî qebûlnekiriye, yên ku di bin navê ol de jin û mêran bi zina tewambar dikin û wan rejm dikin, sîstemên desthilatdar in. Wijdanê civakê di bin navê zina de bi keviran mirovan nakujin û berpirsyartiya vê yekê ranakin.

Xelîl Dag bi heskirin û bawerî nêzî karê xwe dibû

Jina Şoreşger Jinda Asmen da zanîn ku şehîd Xelîl Dag di sala 1995’an de biryara kişandina fîlmên sînema da û wiha got, “Dema mirov dibêjin Xelîl Dag Çiya tên bîra me. Xelîl Dag bi dispilîn, moral û bawerî nêzî karê xwe dibû, dema karek dida meşandin bi her tiştên xwe tevlî wî karî dibû.

Ayşa Silêman/ Qamişlo

Xelîl Dag li Elmaniya jidayîk bûye û li Ezmîrê mezin bûye, hîn ji zaroktiya xwe ve kêfa wî ji kemîre û kişandina wêneyan re dihat. Dema ku kenala MED TV hat damezrandin wî jî cihê xwe têde girt. Êdî gelek mereqbûyîn pêre çêdibû di naskirina Rêber Apo û Tevgera Azadiya Kurdistanê de, dema berê xwe dide qadên Gerîla û ji nêz ve Tevgera Azadiya dibîne, hîs dike ku cihê wî di nav gêrîla de ye û tevlî nava Refên wan dibe.
Di derbarê kesayeta têkoşer û sînameger Xelîl Dag û bandora wî li Şoreşa Rojava Jina Şoreşger Jinda Asmen ji Rojnameya me re axivî.

‘Xelîl Dag bi kar û hezkirina xwe bû Sînemager’

Jina Şoreşger Jinda Asmen diyar kir ku Xelîl Dag gava karek dikir ne ji bo xwe dikir, ji bo derdorê, gel û welatekî dikir û wiha got:” Mirov çiqas li ser biaxive û pesnê wî bide hindike. Dema ez behsa hevaltiyê dikim Xelîl tê bîra min, dema dibêjin serkeftin Xelîl tê bîra min. Dema Xelîl Dag tevlî refên Gerîla bû, xwe kir parçeyek ji wan, bi kar, nêzîkbûn û hezkirina xwe bû şoreşger û sînemagerekî pir mezin. Herwiha karê huner û sînema li ser vî esasî dida meşandin, xwest ku tiştên tên jiyan kirin wan bi riya hunerê bîne ziman û ji dîrokê re bihêle. Jiyana heval Xelîl riya azadiyê bû û sînema jî parçeyek ji vê riyê bû. Herwiha heval Xelîl xwest vê yekê bîne ziman ku Bêrîtan zaroka vê civakê ye û yek ji me ye. Îro roj ku em bi kurdî diaxivin ev bi saya heval Bêrîtane û heval Xelîl jî xwest vî tiştî bîne ziman, di heman demê de dema heval Xelîl têkoşîna heval Bêrîtan anî ziman bû têkoşîna wî jî. Sînemaya kurdî bi hewildana heval Xelîl gavên pir mezin û xurttir avêtin, heya niha di Rojavayê Kurdistanê de jî şoreş hat li darxistin û hîn jî berdewame. Ev feraset û hêza ku heval Xelîl ji Rêber apo girtibû xwestiya di hunera xwe de bide jiyan kirin û bîne ziman. Heval Xelîl bi filmên xwe û bi nêzîkbûna sînema, huner teyîsand Rojava jî. Di şoreşa Rojava de dema filim tên çêkirin bi vê ferasertê tên dîtin.”

Jinê jî cihê xwe di sînemayê de git

Jina Şoreşger Jinda Asmen dawî li axaftinên xwe anî û wiha got: “Li Rojavayê Kurdistanê gelek kes hewil didin ku filmên sînema çêbikin, heger heval Xelîl nasbikin yan nasnekin jî ne pirsgirêke ya girîng ew e ku heval Xelîl ev huner gihand wan, herwiha bi têkoşîneke pir mezin ev huner gihand şoreşa Rojavayê Kurdistanê. Bi saya wî wê berhemên xweştir derkevin, netew wateya xwe bibînin û Şoreşa Rojava hîn zêdetir bi riya hunerê wateya xwe bihêle û jiyaneke hîn xurttir avabike da ku ji bo zarokên wan bimîne. Di vê riyê de jinê jî cihê xwe girt û hevaltiya heval Xelîl kirin, heval Xelîl çi gav avêtiban wê bi meyzandina jinê lê nêrîban, niha jî jinên kurd yên ku di aliyê sînemayê de têkoşîn dikin bi çavên heval xelîl nêz dibin. Dema sînemayekê çêdikin heval Xelîl tînin ziman, ev yek hêzekî avadike û dide xuyanî ku bi têkoşînekî heya têkoşînekî wê bighêje ekadembûyînê. Derfetên ku bi şer, şoreş û çekdarî me girtiye, niha ew derfet me dighîne huner, ekonomî û derfetên jiyanê yên gelemperî. Dema şoreşek çêbibe û huner nebe ev şoreş bi ser nakeve, hunermendên ku bikaribin hunerekî çêbikin divê xwe bigihînin asta şoreşgerekî. pêwîste her kurdek bibe şoreşgerek. Şoreşa Rojava bi hunera şoreşê jî xwe gihand asta civakeke nû ya azad.”

4’emîn Festîvala Amara xwedîderketina li ked û têkoşîna Rêber Apo ye

Navenda nûçeyan

4’emîn Festîvala Amara li herêma Şehbayê ku du rojan dewam kir bi gelek çalakiyên hunerî hat xemlandin. Hevseroka Desteya Ciwan û Werzîşê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Emîna Haj Ebdo anî ziman ku Festîvala Amara ya 4’emîn bi armanca geşkirina rihê ciwantî û parastina çandê hate orgenîzekirin.

Bi dirûşmeya `Bi rihê şehîdan emê şoreşa çandê pêk bînin azadiya fîzîkî ya Rêber APO misoger bikin` Tevgera Ciwanên Şoreşger û Desteya Ciwanan û Werzîşê ya Kantona Efrîn û Şehbayê 4’emîn festîvala Amara bi rojeke hunerî bi dawî kirin.
Festîvala Amara di 8 ê heyvê de bi roja xwe ya hunerî het orgenîzekirin. Roja 2 yemîn ji festîvalê li kampa Berxwedan bi tevlîbûna bi sedan ji gel û ciwanan hat li darxistin. Di bernameya festîvalê de gelek komên stran û guvendan ji Kevana Zêrîn, Tevgera Çand û Hunerê her wiha komên Ciwana û yên zarokan hate xemilandin.

`Festîvala Amara ji bo tevgera ciwanan xwedî cihekî pîroz e`

Di destpêkê de axaftin bi ser navê Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Efrîn û Şehbayê ji aliyê Zûlfiqar Nêrebiyê ve hate kirin. Zûlfiqar di axaftina xwe de festîval li hemû ciwanan pîroz kir, her wiha bal kişand ser îradeya ciwanan û wiha got: “Festîvala Amara ji bo tevgera ciwanan xwedî cihekî bi nirx û pîroze. Her çiqas em di şert û mercên zehmet ji siyaseta dorpêçê û êrîşên dagirkeriyê re derbas dibin, lê dîsa jî me kariye em festîvaleke di vê astê de li dar bixin. Ev yek jî îsrar û hêza îradeya ciwanan dide nîşandin. Bi hêvî ne bi vê rihê em xwedî li xeta şoreş û Rêbertiyê heta dawiyê derbikevin”.

Bernemeya Festîvala Amara

Bernameya festîvalê wiha bû: Helbesta kurdî ji aliyê jina ciwan Dinya û bi zimanê Erebî ji aliyê Mihemed Wê ve hatin pêşkêş kirin, koma strana ya jinên ciwan ya şehêd Nûcan Seros, koma govend; ya zarokan yê Şehîd Reşîd, koma stranan ya pêkhateya Ereb yê şehêd Îlan Sara, koma Çand û Hunerê ya stranan, koma govendê ya Dibistana Şehêd Kendal, koma Kevana Zêrîn ya stranan, stranên tekane hunermend Kemal û koma Mîrko ya govendê yê ciwanan.
Di dawiyî de hemû kom, girop û kesên ku tevlî festîvalê bûne ji aliyê Tevger û Desteya Ciwanan ve hatin xilatkirin. Di derbarê Festîvalê li ser asta 2 rojan de Hevseroka Desteya Desteya Ciwan û Werzîşê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Emîna Haj Ebdo ji rojnameya me re axivî.

`Amara xwedîderketina li keda Rêber Apo ye`

Emîne di destpêkê de anî ziman ku ji bo xwedîderketina li keda Rêber Apo festîvala Amara hat amedekirin û wiha got: “Ji me û tevahî gelê Kurd û yê azadîxwaz hebûna Rêber Apo û felsefeya azadiyê yak u pêşkêşî tavahî cîhanê kiriye hebûneke pîroz e, derketina festîvala Amara jî bingeha xwe ji ew xaniyê kevnar ya gundê Amara yê digire. Bi taybet xwedîderketina ciwanan li ked û têkoşîna Rêber Apo her wiha perspektîvên ku Rêber Apo ji bo ciwanan pêşkêş kirine em bikaribin bikin terzê jiyana ciwanên serdemê. Di heman demê îsal me xwest bi buneya rojbûna rêbertî em 4’emîn festîvala Amara yê li dar bixin. Da ku hêz û îradeya ku rêbertî da ye ciwana her tim mayînde bimîne”.

`Ciwanên kurd li 4 perçeyên Kurdistanê xwe îsbat dikin`

Emîna bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: “Li hember tavahî siyasetên şerê taybet yên ku bi ziraviyên xwe li ser hêza ciwanan tê meşandin, di heman demê li hember tavahî êrîş û hedefgirtinên dijmin yên li ser herêm û ciwanan pêk tîne, pê ve girêdayî pêkanîna siyaseta birçîbûn û lawazkirina hêza îradeya gel li herêmê ya ku ji aliyê Hikumeta Şamê ve tê feriz kirin. li hember van hemû cureyên qirkirina gelê Kurd û bi taybet têkbirina hêza ciwanên Kurd em bi biryardarî, îsrardarî, li ser paradîgmeya Rêber APO û di xeta têkoşîna 50 salî de berdewam kirin. em soza têkbirina van polîtîkeyan didin. Hêza ciwanên Kurd li 4 perçeyên Kurdistanê bi helwest, îdeolojî û piratîka xwe, xwe îsbat kiriye. Vê care jî 4’emîn festîvala Amara bi armanca geşkirina rihê ciwanan her wiha li ser esasê parastina çanda mirovan ya resen xwe îsbat kir û bi ser ket”.

Têbînî

Wêjeya pabend berpirsyarî ye ne alîgirî

Kemal Necim

Wêjeya pabend, ango wêjeya ku xizmet û parastina boçûn û nêrîneke sincî, siyasî, civakî, bîrdozî yan olî dike. Ev danasîneke sivik û giştî ye, lê weke têgeh û pênase mijara wêjeya paband ji hêla pir ramyar û zanyaran ve hatiye gotûbêjkirin. Filozofê Fransî Jean-Paul Sartre derbarê pênaseya wêjeya pabend de dibêje:``Bê guman berhema nivîskî rastiyeke civakî ye û divê nivîskar jî berî ku pênûsê hilgire bi kûrahî ji wê nivîsê bawer be. Bi rastî jî divê hayê wî ji berpirsyariya wî hebe û zanibe ku ew ji her tiştî berpirsiyar e, ji şerên binkeftî yan ên serketî, ji serhildan û zilmê. Eger ne hevalbendê xwezayî yê mezlûman be ew dibe hevkarê zaliman``.
Sartre her wiha behsa rola mezin a wêjeyê di çarenûsa civakan de dike. Wêje berpirsyarê azadî, kolonyalîzm, pêşketin û paşketinê ye.
Nivîskar yek endamên hawîrdora xwe ye, berdevkê wê ye û çeka wî peyvên wî ne, divê armancê baş diyar bike û bi awayekî rast armanca xwe bîne. Nivîskar bi cewherê xwe navbeynkar e û pabendiya wî ew navbeynkarî ye. ”
Di dîroka nêzîk de bi taybet di nîvê sedsala 20`an de pir behsa rola wêjeyê û çandê bi giştî di şoreşên gelan û civakan de dihate kirin, bi taybet di pêvajoya şoreşa sosyalîzmê û tevgerên rizgariya netewî yên di wê demê de biwêjên mîna wêjeya şoreşê yan wêjeya berxwedanê pêş ketin. Lê niha li gorî pir nêrînan dibêjin ku êdî wêje û deqên wêjeyî nikarin wan berpirsyariyên me behs kirin pêk bînin. Her wiha hin kes jî di wê baweriyê de ne ku mijarên parastin û pêşxistina civakan ne erk û delametên wêjeyê ne.
Di civaka Kurdan de ku civaka têkoşîn û berxwedan û şoreş û serhildanan e. Wêjeya berxwedanê xwedî roleke girîng bû. Lê niha derbarê vê mijarê de parçebûn û nêrîn û boçûnên cuda hene. Bi qasî parçebûna siyasî ewqasî parçebûna nêrîn û boçûnê jî heye derbarê vê mijarê de. Beşek dahêner û wêjevanan alîgirên aliyekî siyasî ne û li gorî wan pabendî û berpirsyarî ew e ku têkeve xizmeta wî aliyê siyasî û çi nivîseke ku nekeve ber wê şepêlê ew bê wate ye.
Ji xwe beşek jî dibînin ku berhema wêjeyî pêwîste bi ti awayî nêzî dozên gel û civakan nebe.
Wexta ku em behsa berpirsyariyên exlaqî dikin, mebest ew e ku yê wêjevan pabendî ês û derd û pirsên civaka li derdora xwe be. Ew pirs dibe ku ne pirsa bindestiyê be, yan pirsa şoreş û têkoşîna ji bo azadiyê be, lê dibe ku pirseke din ya civak û mirovan be.
Berhema wêjeyî çi helbest be, çi çîrok û roman yan beşeke din ya dahênanê be, ew heyîna ku dilê mirovan û giyanê mirovan aram û pak dike. Ji xwe mirovên aram û pak dikarin xwedî doz bin, dikarin ji bo maf û azadiyê têbikoşin. Berhema wêjeyî ji civakê û mirovan re nabêje, ev rêya azadiyê ye, ev şêweyên têkoşînê ne, ev rêya rast e. Lê wêje hişê mirovan sayî dike, giyan û dilê wan pak dike ku êdî bixwe li rêyên azadiyê bigerin.

‘Bi cesareta ku min ji Rêber Apo girtiye ez jiyan dikim’

Bi Rojbûna Rêber Apo re, zayîna jiyaneke nû li ser xaka Kurdistanê vejîn bû. Navê vejîn bû. Di rastiya gelekî ku li ber pença qirkirinê bû, hêza wateyê û jiyana bi rûmet afirand. Dayika bi navê Sûreya Hebeş diyar kir ku ew bi fikrê Rêber Apo bû aşiqa azadiyê.

Vîndar Roj/ Şehba

Di Nîsana sala 1949’an de, zayîna jiyaneke nû li ser xaka Kurdistanê vejîn bû. Navê vejîna nû rojbûna Rêber Apo bû. Rojbûna Rêber Apo, di rastiya gelekî li ber pença qirkirinê bû, hêza wateyê û jiyana bi rûmet afirand. Rêber Apo, di temenê zarokatî de jiyan xiste ber lêpirsînê. Ji bo bigihêje bersiva vê lêpirsînê, nakokiyên mezin jiya û dev ji xwe gîhandina xeyala jiyana azad berneda. Rêber Apo, ji bo jina Kurd, gelê Kurdistanê û tevahî gelên azadîxwaz bû dîrok, hêvî û baweriya bi jiyana wekhev û azad. Bi rojbûna Rêber Apo re, li Kurdistanê, bedena ruh ji dest dayî ruh pê hat, hîşa ku ji hebûn, cewher û evîna xwe ya jiyanê biyanî bûbû jinûve jîndar bû.
Bi buneya rojbûna Rêber Apo ji kevintirîn jinên ku di nava şoreşê de kar kiriye û Rêber Apo dîtiye her wiha di Saziya Malbatên Şehîdan de cih digire Sûreya Hebeş ji rojnameya me re axivî.



`4 ê Nîsanê Zayîna azadî û mirovahiyê ye`

Sûreya di destpêkê de Rojbûna Rêber Apo li hemû gelê Kurd pîroz kir û wiha axivî: “Kêfxweşiya herî mezin ji bo me derketina Rêber Apo û Felsefeya wî ya azadî û demokrasiyê ye. Rojbûna Rêber Apo ne weke rojbûneke normal em pîroz dikin. Bi zayîna Rêber Apo re li hemû cîhanê tava azadiya mirovahiyê û şikandina zincîrên koletiyê hatiye hilatin. Rêber Apo ji zaroktiya xwe ve jî weke însanekî ji rêzê nebû û gelek caran ev yek aniye ziman. gotiye “Bi serê derziyê min bîrek dikola” ew bîra ku bi derziyê hatiye kolandin niha bûye deryayek ji felsefê û îdeolojiya azadiya mirovakiyê û demokratîzekirina civakan. Ev rojbûn rojbûna azadiyê û mirovahiyê tê pênasekirin û destgirtin.”

`Hebûna gelê Kurd di nava pencên qirkirinê de parast`

Sûreye bal kişand ser têkoşîna ku Rêbertî meşandiye û wiha got: “Têkoşîna ku bi 4 qehremanan hatiye destpêkirin, tu kes bawer nedikir ku ev têkoşîn bigihîna asta xwe ya îro hêza îradeya hevgirtî û baweriya ku Rêbertî di nava komên xwe de çandibû hêşt ku niha bi milyonan însan li ser felsefeya Rêber Ocalan bimeşe her wiha bibe terzê têkoşînê li hember faşîzmê û hêzên navnetewî. Rastiya vê têkoşînê heye ji lewra jî kêliyekê nehat rewestandin û her mezin dibe. hêviya vejînkirina doza gelê Kurd û azadiya gelên bindest tenê bi şexsê Rêbertî re pêş ket. Ji bo parastina dîrok, çand, nasname, hebûna gelê Kurd têkoşîn destpêkir. Ji lewra bi Rojbûna Rêbertî re rastiya hebûna gelê Kurd her wiha rastiya siyaseta ku Mordernîteya Kapîtalîst li ser tavahî gerdûnê dide meşandin were zelal kirin.”

`Bi naskirina fikirê Rêbertî re ez bûm aşiqê şoreşê`

Her wiha yadê Sûreya qala naskirina xwe ji fikira Rêbertî re kir û her wiha bandoreke çawa li ser kesayeta wê da avakirin û wiha got: “Fikira Rêber APO di sala 1984 an de me nas kir lê di sala 1988 an de li helebê em pê ve hatin girêdan. Ev fikir bi riya Kasêtan û deng qeydkirinê dihat belavkirin. Hemû malên me bûn qeregeh û cihên xwendina fikira Rêbertî. Di wê demê de êdî em bûn aşqê şoreşa ku rêbertî ji me re diyar kiriye. bi awayekî acayîb ez bi vê xebatê ve hatin girldan. Rûxmî zarokên min biçûk bûn û çanda malbatên berê pir hişk bû lê dîsa jî ez derketim ji malê. Bandora ku li ser kesayeta min hatiye kirin, hêşt ku ez wê demê bibim jinek ku li ser tavahî malbatê bandora xwe hebe.”

`Bi cesareta ku min ji rêbertî standiye jiyan dikim`

Yadê Sûreya anî ziman ku wê 2 cara Rêbertî dîtiye û cara yekemîn bi doza azadiya jinê bihîst û wiha domand: “Hevdîtina me bi Rêbertî re 2 caran li Libnanê hat pêk anîn. Bê guman ev naverokên her du hevdîtinan jî gelekî giran û girîng bûn. Yekemîn care bi xwediyê felsefeya azadiyê û bi taybet bi serokê gelê Kurd re mayîn cihê heyecan û morale bû. Bi taybet di wê demê de me yekemîn car bi awayekî zelal û nêzî rastiyê me bi doza azadiya jinê bihîst û em jin çi ne. em yekemîn car ketin ferqa girîngiya hebûna xwe û rastiya jinê di civakê de. ji wê demê û heyanî niha ez bi wê hêz, îrade û cesareta ku min ji kesayeta Rêbertî standiye jiyan dikim.”

4`ê Nîsanê ji bo tevahiya gelan rojbûna azadiyê ye

Hêvî Melek/Qamişlo

4`ê Nîsanê rojbûna Rêber Apo ye û gelê Kurd her sal çalakiyên cur be cur bi vê boneyê li dar dixin. Kanîwar Şêxo diyar kir ku ew jî wekî wênesazên kurd xwestin ku dest bi pirojeyekê bikin û pirojeya me jî ew e ku em di riya wêneyan de çîrokên civaka xwe bi tabloyan vedbêjin.

4`ê Nîsanê rojbûna Rêberê mirovahiyê Abdullah Ocalan e, rojbûna wî ji bo gelê Kurd roja rizgarkirina ji bindestiyê û rêya ronahiyê, zanist û fikrê azad e. Her wiha gelê Kurd ji bo rojbûna Rêber Abdullah Ocalan her sal çalakî û pirojeyên cur bi cur destpêdikin, yek ji van pirojeyên ku ji bo rojbûna Rêber APO hatine dest pêkirin, pirojeya xêzkirina wêneyan li ser dîwarên lîstikgeha 12`ê Adarê ye ku ji aliyê 3`ê wênesazên girêdayî navenda çand û hunerê ya Mihemed Şêxo ve hatiye dest pê kirin. Di derbarê vê mijarê de endamê Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo wênesaz Kanîwar Xêşo ji rojnameya me re axivî.

Rêze dîroka serhildanên Kurdan

Kanîwar diyar kir ku me xwest weke navenda çand û hunerê pirojeyekê ji bo rojbûna Rêber Apo bidin destpêkirin û wiha got pirojeya me jî ewe ku wêneyan li ser dîwarên lîstikgeha 12`ê Adarê xêz bikin mijara van wêneyan jî li ser rêzedîroka avabûna PKK`ê ji ku derê dest pê kir çawa ava bû. Wêneya yekem mijara wê li ser civîna ku Rêber Apo li ser bendava çibûkê bi awayekî veşartî li dar xistibû û serkeftiyên ku PKK`ê bi dest xistin ji wê demê heya roja îro, mijara din jî li ser avabûna Yekîneyên Parastina Gel (YPG)`ê, QSD`ê û serkeftiyên ku bi dest xistin û ber bi firehbûnê ve diçû, Kanîwar da zanîn ku 29 tablo ne û her yek ji van tabloyan serkeftinên Kurdan nîşan dide. Mijarên wan jî ji hev cudaye, dema ku em van wêneyan çêdikin kêfxweşî û coşek pir mezin dikeve dilê me de ji ber ku ev wêneyên ku em çêdikin temsîla ked, êş û azarên gelê Kurd têde derbas bûne tê kirin û em dîroka Kurdan ji her kesî re didin xwiya kirin her wiha li beramberî wê jî gelek serkeftî jî hatine bi dest xistin, pirojeya wêneyan jî wê heta meha Gulanê bi dawî bibe.



Di riya wêneyan de çîroka gelê Kurd hat pêşkêşkirin

Endamê navenda çand û hunerê ya Mihemed Şêxo wênesaz Kanîwar Xişo di dawiya axaftinê xwe de wiha anî ziman ku Pirojeya xêzkirina wêneyan li ser dîwarên lîstikgeha 12`ê Adarê ji bo rojbûna Rêberê gelan Abdullah Ocalan ji aliyê 3`ê kesan ve hatiye amadekirin Kanîwar Şêxo, Mehmûd Şêxî û Qasim, di baweriya me de em karekî pîroz dikin ji ber ku em behsa dîrokeke demdirêj dikin kar, xebat, destkeftiyên ku bi dest xistine heta ku gihaştine vê astê dibe ku kêmaniyên me jî derkevin ew jî ji ber ku em di 29 tabloyan de behsa dîrokeke dem direj dikin lê em hewil didin ku gelek çîrokan bînin ser ziman.

‘Li Efrînê tevahiya pîvanên mirovî tên binpêkirin’

Endama Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Daliya Henan diyar kir ku ji dema dagirkirina Efrînê û heya niha, kiryarên dijmirovî yên dewleta Tirk û çeteyên wê bênavber didomin, herwiha li hemberî van kiryaran jî tevahiya cîhan bêdeng e.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Ji 18’ê Adara 2018’an ve roja ku dewleta Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê ku li Efrîna dagirkirî pêk tîne, endama Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Daliya Henan li rojnameya me re axivî. Daliya Henan diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ji sala 2018’an û heya niha sûcên xwe li Efrînê berdewam dike û wiha got: “Di encama dagirkeriyê de, gelê Efrînê neçar man ku bi darê zorê dest ji cih û warê xwe berdin û koçberî herêmên cûda bibin. Herwiha koçberî jî zemetiyên cûda cûda bi xwe re tîne, him jî bandoriyên xwe yên aborî, civakî, perwerdeyî û hwd… hene, ji ber piştî dagirkirina Efrînê hijmareke mezin ji zarokan ji xwendina xwe qut bûn, ev tişt hemû bandorê li ser biskolojiya civakê dike. Herwiha gelên Efrînê yên ku di piştî dagirkirina wê di Efrînê de man, tevî ku hejmareke kêm jî, lê ew hejmara mayî ji komên çete rêzgar nebûn, her tim di bin zext û zorê de ne. Rojane kuştin, girtin, işkencekirin, destirêj û revandin ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve li Efrînê pêk tê.”

‘Sûcên ku li Efrînê pêk tên, derveyî pîvanên mirovî ne’

Daliya Henan di berdewamiya axaftina xwe de eşkere kir ku guhertinên demografîk li Efrînê pêk tên û wiha got: “Li şûna mirovên resen yê Efrînê, xelkên Xûta û herêmên cûda li Efrînê tên bicihkirin. Niha jî bi 10`an kompên mîtîngeriyê tên avakirin û malbatên çeteyên girêdayî dewleta Tirk lê tên bicihkirin. Ji derveyî vê yekê Efrîna ku bi darên xwe yên zeytûnê dihat xemlandin, ji aliyê dewleta Tirk ve hatin birîn, şînwarên wê tên dizîn, yanî sûcên di astên bilind de di derheqê gel û xwezaya Efrînê de tê kirin, di heman demê de cihên olî jî hatin rûxandin, ev hemû komî ser hev bikin ne binpêkirinin ev sûcên şer in. Ev sûcana deveyî zagonên navnetewî, mirovî û hiqûqî ne.”

‘Zagonekî ku mafê wan biparêze tune’

Daliya Henan anî ziman ku ne ji mafê tu dewletê ye ku civakekê ji axa wê dûr bixe û wiha got: “Ne mafê tu dewlet û mirovekî ye ku civakekê ji çand, ziman û axa wî bêpar bike, lê li Efrînê ev hemû sûc pêk hatin û hîn jî berdewamin. Bi 10`an mirovên Efrînê ji

ber sûcên çeteyên dewleta Tirk mirine û berameberî van kiriyarên ku têne kirin bê çare ne, ji ber tu hêzekî piştgiriya wan bike, zagonekî ku mafê wan biparêze, dadgehekî ku berê xwe bidênê û heqê xwe jî bistînin tune, ji ber ku ên ku wir birêve dibin çeteyên girêdayî dewleta Tirk in, heyanî nexweşaneyên li Efrînê jî gelek mirovên Efrînê nexweş derbasî wan bûn mirî derketin, ji ber perçeyên laşê wan dihatin dizîn.”

‘Pêkanîna biryara 2254 misogeriya aramiyê ye’

Endama Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Daliya Henan axaftina xwe wiha qedand: “Divê bendek ji kiryaran dewleta Tirk yên li Efrînê pêk tîne, bê çêkirin, ev bend jî encex di riya zagonên navnetewî be. Herwiha divê hêzên navnetewî û civakên navnetewî tevger bikin ji bo ku rê li ber van kiryaran bigire. Lê mixabin em dibînin ku civaka navnetewî û Saziyên Mafê Mirovan wek tê xwestin bi erkê xwe ranabin, ev jî dide diyarkirin ku ew hevkarên sûcên van kiriyaran ne. Pêwîste ev kiryarên di dadgehên navnetewî de bên nîşandan û ev kûjer werin dadgehkirin, di destpê de dewleta Tirk ê ku piştgiriyê dide van komên çeteyan. Banga me jî biryara 2254 pêk were, ji ber ev biryar pêk were wê aramî pêk bê.”
Hêjayî gotinê ye ku ruxmê ewqas sûcan jî, gelê Efrînê nasname û çanda xwe parastiye ji ber girêdanekî wanî xurt bi axê re heye û ew bi gelê berxwedêr tên naskirin.

3’ê Milyon û 700 hezar Îmze hatin komkirin

Navenda Nûçeyan

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdarbûna xwe ya girseyî di Kampaniya komkirina Îmzeyan de ku di 9’ê Sibatê de ji aliyê Însiyatîfa Gel a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve hatibû destpêkirin û di 4’ê Nîsanê de di Roja Rojbûna Rêber Apo bi dawî bû, peyam dan tevahî hêzên komploger ku ew ê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têkoşînê dewam bikin. Herwiha gel bi beşdarbûna xwe asta hezkirin, piştevanî û baweriya bi felsefeya Rêber Abdullah Ocalan nîşan da.

Di çarçoveya Pêngava Cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku di 10’ê Cotmeha 2023’an de bi dirûşmeya “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî” li ser asta cîhanê hatibû destpêkirin û li tevahiya cîhanê deng veda.
Însiyatîfa Gel a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 9’ê Sibatê de bi daxuyaniyekê ku li bajarê Qamişloyê hatibû dayîn, kampanyaya komkirina îmzeyan dabû destpêkirin. Di çarçoveya kampanyayê de li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Heleb, Şam, Hema, Humis, Laziqiye, Sweyda, Quneytera, Selamiye û Tertûsê îmze hatin komkirin. Bi taybet gelên herêma Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî girseyî tevlî kampaniyê bûn û helwesta xwe anîn ziman. Di 4’ê Nîsanê de Roja Rojbûna Rêber Abdullah Ocalan de kampaniya komkirina îmzeyan ya ji bo azadiya wî ya fîzîkî bi dawî bû. Însiyatîfa Gel a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, di 8’ê Nîsanê de bi daxuyaniyekê encamên kampanya komkirina Îmzeyan aşkera kirin.
Li gorî Insiyatêfa Gel a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê encamên kampaniya komkirina îmzeyan wiha ne:
Minbic: 711,180
Reqa: 701,845
Qamişlo: 625,343
Hesekê: 603,800
Dêrezor: 337,70
Tebqa: 281,332
Firat: 134,570
Heleb: 103,857
Efrîn û Şehba: 51,212
Hundirê Sûriyeyê: Şam, Heleb, Laziqiye, Suweyda, Quneytera, Selamiye, Tertûs, Hama, Hums: 6,243
Koçberên Kurd li Lubnanê: 12.000
Hêzên Parastina Civakê: 100.000
Hejmara giştî ya îmzeyên kampanyayê: 3 669 090
Kampaniya komkirina Îmzeyan ku di 9’ê Sibatê de hatibû destpêkirin, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi awayekî berfireh dest pê kir û belavî bajarên din wekî Şam, Heleb, Selemiyê, Humis, Hema, Siwêda, Laziqiyê û Quneytîra bûn. Hate diyarkirin ku berfirehbûna kampanyayê asta girêdana tevahî, netewe, mezheb û beşên civakê bi fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan îsbat dike û hate gotin: “Felsefeya Rêber Abdullah Ocalan, aloziya Sûriyeyê jî di nav de ji tevahî doz û pirsgirêkên bi girêk ên asêmayî yên li Rojhilata Navîn re zemîna çareseriyê ye.”
Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdarbûna xwe ya girseyî de di kampaniya imzeyan de îmzeyên de , peyam dan tevahî hêzên komploger ku ewê ji bo azadiya Rêber Apo têkoşînê dewam bikin. Her wiha hate diyarkirin ku ev peyam di heman demê de asta hezkirin, piştevanî, baweriya bi felsefeya Rêber Ocalan û israra gel a ji bo pêkanîna azadiya Rêber Ocalan nîşan dide.
Di demên pêş de wê encamên Kampaniya Komkirina Îmzeyan ji bo Konseya Yekitiya Ewropayê û hemû rêxistin û saziyên mafên mirovan ên pêwendîdar ên navneteweyî bê şandin.

‘Îradeya Gelan wê dawiya desthilatdariya faşîst ya Erdogan bîne’

Hêzên hegemonîk ji bo berjewendiyên xwe siyasetên qirkirinê li ser gelên Rojhilata Navîn didin meşandin. Dewleat Tirk jî di pêkanîna van siyasetan de xwedî roleke sereke ye. Endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Esaed Menan anî ziman ku hilbijartinên herêmî planên Erdogan têk bir.

Zana Roj/ Şehba

Li seranserî Rojhilata Navîn şer, qeyran û guhartinên mezin pêk tên. Di nava van geşedanan , di kûrkirina kirîz û şerên Rojhilata Navîn de jî rola Erdogan sereke ye. Têkildarî giştî siyaset û kirîzên li Rojhilata Navîn, bi taybet şerê Îsraîl û Hemasê her wiha hilbijartinên herêmî yên Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, endamê Meclisa Gîştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) ê Eseed Menan ji rojnameya me re axivî.

-Hûn nêzîkatiyên Erdogan ji doza filestînê re çawa dinirxînin? Di şerê Îsrayîl û Hemasê de Tirkiyê çi rol lîst?

Têkiliya di navbera Tirkiyê û Îsrayîlê de têkiliyên dîrokî ne, ji dema Cihû û Osmaniyan ve dikişe. Di gelek deman de Cihuyan bandora xwe li ser biryarên Osmaniyan dikirin. Ev rewş heyanî avakirina komara Tirkiyê dirêj kir, di sala 1923 an dema Mustafa Kemal Komara Tirkiyê avakir, cihûyan rola xwe ya girîng heyanî wê demê parast û bandora xwe li ser komara nû jî hebû. Li ser vî esasî dema dewleta Îsrayîlê di 1948’an de hatiye avakirin yekemîn dewleta Îslamî ku destek da Îsrayîlê; Turkiye bû. Di serdema AKP’ê de û erkdarkirina Erdogan di wê pêvajoyê de ne ji rêzê bû. Erdogan weke şagirtekî hat mezinkirin û rê li pêşiya Erdogan hat vekirin. Bi kurtasî em dikarin bêjin erkdarkirina Erdogan bi destê serdestan hat kirin û bi avakirina AKP’ê ya ku weke partiyekî îslamî dihat dîtin, ji bo rola hemû partiyên din di Tirkiriyê tune bike û doza herî dilsoz ya îslamî di wê demê de jî bêguman doza Filistînê bû. Û bi demê re Erdogan xwe weke piştgir û destekdanê yekemîn ji doza Filistînê re da xuyakirin. Li ser wê esasî dest bi avakirina partiyên îslamî di Rojhilata Navîn de kir. Bê guman armanca serdestiyê û ya Erdogan çi bû, nûjenkirina Împaratoriya Osman bû. Ji kevin de û heyanî niha Tirkiyê di doza Filistînê û Îsrayîlê de li ser du şaxan dilîze. Di aliyekî de destek dide doza Filistînê û di vê şerê herî dawî de xwe dijberê herî sereke li hember Îsraylê dide nîşandan. Him jî têkiliyên xwe yên bazirganî û hwd bi Îsrayîlê re nedane rawestandin û parastina têkiliyên kevin dike. her wiha divê em ji bîr nekin ku Hemas bi destê Îsrayîlê hat avekirin, ji bo ku Îsrayîl Yasêr Arafat û siyaseta wî ya avakirina dewletek Filistînî birûxîne… Hemas avakir.

Ji pênc mehan ve şerê Hemas û Îsrayîlê tê domandin. Di wê şerî de bi hezaran gelê Filistînê koçber, winda û şehîd ketin. Soza ku Erdogan ji bo doza Filistînê jî dida yek jî pêk neanîn. Di vî şerî de tenê li pey parastina berjewendiyên xwe ketiye.

-Ji giştî şerên ku li cîhanê diqewimin, Tirkiyê bi tevlîbûna xwe ji van şeran re sûdekî cawa werdigre?

Tirkiyê di bin hişmendiya zindîkirina serweriya Osmaniyan de. ji xwe re heq û rewa dibîne ku mudexeleyî hemû Rojhilata Navîn û qismek ji Ewropayê bike. Ii ser esasê pêkanîna Mîsaqa Milî destwerdanê li Sûriyê, Bakurê Îraqê, Rojava û Başûrê Kurdistanê dike û dibêje ev erdên mine divê ez vegerînim. Di vê dawiyê de modexeleya Lîbiya jî dike her wiha li Efrîqiya yê, di şerê Okrayîna û Rûsiya de jî rûxmî dostaniya wî bi Rûsiya yê re lê di binî de piştgiriya Okrayîna dike û balafirên bê pîlot ji wan re rêdike. Bi van mudexeleyan dixwaze xwe weke hêzeke sereke bide nîşandan. Bê guman encama meşandina van siyasetan bi encamên neyînî li Erdogan vegeriyan. Ew jî di derketina encamên hilbijartinên li Tirkiyê hat tekez kirin.

-Giştî geşedanên siyasî yên li cîhanê tên qewmandin, çiqas li ser herêmêm Bakur û Rojhilatê Sûriyê bandor dikin?

Di sedsala 21 mîn de hemû cîhan weke gundekî bûye. Destkeftiyên ku gelê Kurd di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de bi destxistine û çawa ku gelê Kurd di aloziya Sûriyê de xeta xwe ya serbixwe girt û xwe ji cîhanê re îsbat kir. Ii ser paradîgmeya Netewa Demokratîk Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê sûriyê hatiye avakirin û Kurd hemû netew, gel û pêkhateyan di nava xwe de dihewînin. Ev pêşketin li pêşiya çavên cîhanê hatine kirin û tavahî hêzên navnetewî û gilobal di wê zanebûnê de ne. aloziya sûriyê her ku tê dirêjkirin û xaka Sûriyê bi temamî hatiye perçekirin. Cîhan di wê zanebûnê de ye ku tu çareserî ji bo aloziya Sûriyê û gelê Sûriyê nîne ji bilî Pirojeya Netewa Demokratîk.

Ji ber vê em cihê xwe di hemû guhartin û veguhartinên di cîhanê de tên rûdan digrin û bandore li me jî dike. Emerîka ji bo tunekirina DAÎŞ ê yekgirtinek ku nêzî 80 dewletî pêk dihat avakir û me jî cihê xwe tê de girt. Ji wan 80 dewlet û hêzên cîhanî tenê QSD ê li hemer DAÎŞ şer kir. ji ber vê jî bandora me li ser tavahî cîhanê heye û tu kes nikare me tune binebisîne.

Em jî hemû siyaset û guhartinên ku di cîhanê de tên kirin baş dixwînin de bi ser dikeve. Serkeftina DEM Partiyê serkeftina me hemû Kurdan e. bê guman ji bo li pêşîgirtina îradeya gelê Kurd Faşzma Tirkiyê hovîtiya xwe da meşandin, lê vê carê tu encam bidest nexist.

Bê guman di encama siyasetên ku Erdoxan di salên dirêj de dida meşandin û bandora wê li ser gelê Tirkiyê her wiha têkçûna aboriya wê di salên dawiyê de, hêşt ku AKP ê ne tenê di Kurdistanê de lê di giştî Tirkiyê de bi bin bikeve. AKP ê wê bi vî awayî wê nikaribe desthilatdariya xwe berdewam bike, ji ber bi van binketinan wê di hilbijartinên Serokkomarê de jî bi ser nekeve. Bi vê yekê guhartinên wê bêne çêkirin wê bandora xwe li ser tavahî Kurdistanê û Sûriyê bike.

Ihtîmala êrişan mezine, baldarî pêwiste!

Dilyar Cizîrî

Di 31’ê Adarê de li Tikriyê û Bakurê Kurdistanê hilbijartinên şaredariyan hatin lidarxistin. Dûrî hêvî û nirxandinan û tevî hemû hewldanên AKP’ê û MHP’ê ya destdirêjiya di hilbijartinan de, DEM Partiyê li Kurdistanê piraniya şaredariyan û bi encamekî bilind bi dest xist. Li Tirkiyê jî Erdogan têk çû. Ya herî balkêş jî dema hikûmeta AKP’ê xwest destê xwe dirêjî encamên hilbijartinên Wanê bike, gelê kurd bi yek destî xwedî li dengên xwe derketin û tevahî bajar veguherîn qada têkoşînê. Bajarên Bakurê Kurdistan û Tirkiyê ji bo Wanê rabûn ser piyan. Piştgiriya Kurdistaniyan li Rojava û derveyî welat, berxwedana Wanê hîn xurtir kir.

Di encamê de dewleta Tirk a faşist ku tu carî xwe li hebûna gelê kurd ranagire, neçar ma ji lîstikên xwe gavan paş de bavêje. Bi vê xwediderketina gelê Bakur êdî wê dewleta Tirk nema karibe bi hêsanî qeyûman li şaredariyên Bakurê Kurdistanê bi cih bike. Ev ji bo gelê kurd bû pêngavekî nû ya têkoşîna ji bo azadiyê.

Li aliyê din jî dewleta Tirk ev 3 sal in bi hemû hêza xwe hewil dide li dijî Gêrîla gavan bavêje û qadên gêrîla yên li Başûrê Kurdistanê dagir bikin. Tevî hevkariya PDK’ê û anîna bi hezaran çeteyan bi çekên herî pêşketî yên NATO û bikaranîna çekên qedexekirî, heta niha nikare gavan pavêje. Berûvajî wê di Newrozê de Fermandariya Navenda Parastina Gel (NPG) mizgîniya bidexstina çekên xistina balafirên bê mirov ên dewleta piraniya şerê xwe li ser wê didan meşandin, ragihand. Di heman demê de dîmenên xistina hejmarek mezin a balafirên bê mirov ji aliyê Gêrîla Tv ve hatin weşandin. Ev jî derbeyek din a mezin di pergala faşist a AKP/MHP’ê de bû.

Êrişên wan li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê her çendî binesaziya herêmê kir armanc û xwest welatiyan tengav bike, da ku li dijî Rêveberiya Xweser serî hildin, plana wan têk çû. Rêveberiyê karîbû heta radeyekê nehêle pirsgirêk zêde bidin der. Berûvajî wê hevpeymana civakî ya nû hate erêkirin, niha amedekariya lidarxistina hilbijartinên şaredariyan tê kirin. MSD’ê hewl dide dî demên pêş de kongreya nîştimanî ya muxalifên Sûriyê ava bike. Gelek hêz û kesayetên ji herêmên Sûriyê ku hin ji wan gelekî nêzî Erdogan bûn, lê niha cihê xwe di nava xebatên MSD’ê de digre.

Li kêleka xalên me li jor rêz kirin rewşa aborî ya Tirkiyê berê di rojevê de ye û her kes dizane siyaseta Erdogan lireya Tirkiyê aniye çi astê. Ev jî herîfîna sîstema wan hîn zêdetir pêk tîne. Ji ber wê jî pêwîste di serî de gelê kurd û hemû dostên wan li hestyariyeke mezin li vê qonaxê binêrin. Erdogan li beranberî rewşa heyî wê hewl bide, berê civaka Tirkiyê bide derve.

Ji xwe di rojeva wan de êrişa berfîreh a li dijî Gêrîla û qadên berxwedanê heye. Lê ihtîmala mezin Erdogan êrişan li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê yan jî Şengalê pêk bîne. Lê ji ber balafirên wan ên bê mirov li Başûrê Kurdistanê bê encam bûne, dibe ku êrişî Bakur û Rojilatê Sûriyê bike.

‘Kurdên Bakurê Kurdistanê di hilbijartinan de hebûna xwe isbat kirin’

Sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Fewzî Şengalî da zanîn ku kurdan di hilbijartinên şaredariyên Bakur û Tirkiyê de tevî hemû zehmetiyan bi vîneke mezin xwe isbat kirin. Herwiha li gorî encamên van hilbijartinan diyar dibe ku desthilatdariya AKP’ê di demeke nêz de, wê were bidawîkirin.

Hemza Sêvo/Qamişlo

Di 31’ê Adarê de hilbijartinên şaredariyên Bakurê Kurdistan û Tirkiyê pêk hatin. Di encama van hilbijartinan de jî tevî hemû astengiyan, DEM Patiyê bi ser ket û piraniya şaredariyên ku di bin serweriya faşista AKP’ê de bûn, bi saya dengdayîna gelê kurd bi dest xist. Her wiha têkildarî heman mijarê jî Sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî li Sûriyê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

Hûn pêşveçûna hilbijartinên şaredariyên Bakurê Kurdistan û Tirkiyê çawa dinirxînin?

Hilbijartin sîstemeke yasayî ye û ji mafê her miletekî ye ku bi rengekî normal de li welatê xwe çêbike. Ger em hilbijartinên Bakur û Tirkiyê binerxînin dê li gorî rewşa siyasî ya derve û hundirîn, rewşa desthilatdarî û hikumetê ev hilbijartin wê Tirkiye ber bi qonaxeke nû ve bibe. Weke ku em dizanin ev bû zêdeyî 20 salan AKP’ê serweriya xwe li ser gelan dineşîne û heya roja îro li ser heman hişmendî û heman siyasetê Tirkiyê bi rê ve dibe. Lê gelên Tirkiyê ji AKP’ê re gotin ev siyaseta te nema dikeve xizmeta me de, êdî di aliyê çandî, siyasî, aborî û hwd… ve pêş ve bibî û serweriya xwe li ser me ferz bikî. Ne ku em pirobogandaya çêdikin,lê bi rastî jî rewşa Turkiyê wiha ye. AKP’ê bi xwe jî vê yekê dizane. Erdogan piştî encamên hilbijartinan de got, em ê li xwe vegerin û nas bikin ku sedema binketina me û kêmbûna dengên ji bo me çi ye. Rast e niha hikumeta AKP’ê serwer e û di hilbijartinên şaredariyan de bi bin ket lê di demê pêş de ger hilbijartinên din yên dewletê pêk werin wê gel nema dengê xwe bide wê. Ev yek tê wateya ku dawiya hikumeta AKP’ê hin bi hin nêzîk dibe. Di heman demê de wê di hilbijartinên din de jî bi bin bikeve û serweriyê ji dest bixe. AKP’ê nikare pirsgirêkên hundirîn û derveyîn çareser bike, yek ji van pirsgirêkan; binçavkirina bi sedema siyasetê û dabpêdana mafê netewên din e. Ger AKP’ê li ser heman hişmendiyê serweriya xwe bike û dewletê bi rê ve bibe, ji ber ku ne xwedî pirojeyeke bingehîn e ji bo bidawîkirina kirîzên xwe ye. Li aliyekî din jî ger em binêrin opizisiyona li hember hikumeta AKP’ê weke CHP’ê û yên din jî pirojeya ji bo dawîkirina kirîza gelên Tirkiyê tune ye. Tişta ku van aliyan sûd jê giritin binketina AKP’ê bû, ji ber ku armanca wan ev yek bû. Lê pêwîste ev opizisiyon; weke opizisiyoneke demokratîk û ji her netewekê re vekirî be. Hem jî di dema pêş de xwedî pirojeyekê be ku bikaribe kirîza ku gelên Tirkiyê tê de dijîn çareser bike.

Tevî ku hikumeta AKP’ê hemû rêbazên sexte bikar anî ji bo ku di hilbijartinan de bi ser bikeve, lê dîsa jî gelê kurd bi vîna xwe bi ser ketin, hûn vê yekê çawa şîrove dikin?

Bi sedên salan e ku gelê kurd li Bakurê Kurdistanê rastî tunekirin, koçkirin, binçavkirin û komkujiyan ji aliyê desthilatdariya Tirkiyê ve tê. Ger em binêrin ji 15 salan berî niha û bi şûn ve rewşa kurdên Bakur gelekî zehmet bû, ji hemû waran ve mafê wan hatiye xwarin û girtinên bi hinceta karê siyasî pir bû. Her wiha desthilatdariya Tirkiyê siyasetek wiha bi kar tanî ku digot gelê kurd ‘Hûn tunene, Hûn nînin û divê nemînin’. Lê tevlîbûna kurdan di van hilbijartinan de ji siyaseta AKP’ê re bû bersiveke mezin. Gelê kurd êdî gotin em hene, ev dever welatê me ye, em kurd in û em ê dengê xwe bidin xwe. Weke em dizanin biryara di derheqê Ebdella Zêdan hevserokê Şaredariya Wanê de hat girtin yek ji rêbazên hikumeta AKP’ê ya sexte bû. Hinceta ku DEM Partiyê Şaredariya Wanê bi rengekî ne zagonî bi dest xist, dûrî rastiyê bû, ji ber ku rêjeya dengdayînê li ber çavê her kesî bû. Di heman demê de vegera Zêdan weke hevserokê şaredariyê û bidestxistina Şaredariya Wanê bi saya vîn û helwesta bi nirx a gelê kurd bû. Gelê kurd êdî rastiya xwe nas kirye û ji pilanên hikumeta AKP’ê re hişyar e, ji ber vê yekê gelê kurd destê xwe kirin destê hev û xwe isbat kirin. Em serkeftina ku piştî berxwedan û vîna gelê kurd a mezin pêk hat, pîroz dikin.

Serkeftina DEM Partiyê tê çi wateyê û ji cîhanê re çi name da?

Serkeftina DEM Partiyê piştî dengdayîna gelê kurd û daxwaza kurdan pêk hat. Gelê kurd daket qadan û gotin em xwedî dozeke rewa ne, bi vî awayî jî gihane armanca xwe. Tevî fişara siyasî, girtin û hemû kiryarên di derheqê gelê kurd de pêk tên, serkeftina kurdan encam bû. Bi vî rengî bû û serkeftin hat bidestxistin, ger hilbijartin bi rengekî demokratîk bi rê ve biçûya û sextekarî di hilbijartinan de nehatiba bikaranîn dê encam ji wiha baştir ba. Cîhan tev jî rewşa hilbijartinên şaredariyan dişopand, ev hilbijartin ne tenê bi çavê hilbijartinên şaredariyan lê dihate meyze kirin. Lê belê tenê wate dida rêjeya dengdayînê û civak bêhtirî xwe dengê xwe didin kî. Hemû cîhan hilbijartinên Bakur û Tirkiyê dişopandin û nas kirin ku êdî desthilatdariya AKP’ê nema dikare pirsgrêkên xwe çareser bike. Cîhan bi giştî rewşa dosiyaya girtiyên siyasî dizane, bi taybet ji wan kesan Rêber Apo, Selahedîn Demirtaş û bi sedên din yê ku di zindanan de ne. Her wiha danûstandinên dewletên cîhanê û helwesta wan têkildarî mijara dewleta Tirk bi şerê Sûriyê, Lîbiya Îraq, Okraniya û hwd… hetanî DAIŞ’ê, têkiliyên aborî û siyasî wê helbet werin guhertin. Roja îro pirsa ku di bala her kesî de ew e ku wê rewşa AKP’ê ber bi kû ve biçe, rewşa dosiya û pirsgirêkên derveyîn û hundirîn çawa be. Ev yek jî li ser opizisiyonê û pirojeyên ku pêwîste bi rengekî demokratîk werin kirin, dimîne. Lê nameya ku gelê kurd û DEM Partiyê di van hilbijartinan de dan ew bû ku kurd hene, mafê wan di dengdayînê de heye û xwedî doz in. Her wiha bi yekîtiya gelê kurd tevî zehmetiyên ku derdiketin, dikarîbûn di van hilbijartinan de bi ser bikevin.

Tengezariyên Erdogan

Zekî Bedran

Di encama hilbijartinên Tirkiyê de CHP wek partiya yekem derket. AKP’ê tevî hemû derfetên dewletê û çapemeniyê jî winda kir. Di hilbijartina de encameke wiha bi giştî nehatibû pêşbînikirin. Lê ji hilbijartinên meha Gulanê û vir ve Erdoğan nekarî ti gavan ji bo çareserkirina pirsgirêkên welat bavêje. Çalakiyên dawî yên gerîla hewa ango dilxweşiya wan girt û moralek mezin da gelê Kurd. Kampanya ji bo azadiya Rêber Apo, helwestî û berxwedniya wî ya li Îmraliyê atmosfera siyasî da guhertin.

Erdoğan ji bo ku plana xwe ya qirkirina gelê Kurd bi cih bîne, gelekî xebitî. Ji sala 2015’an û vir ve her tim di nav êrîşan de ne. Digotin “Em bêhndayinê nedin Kurdan” şer û êrîş mezin kirin. Erdogan pesnê xwe da ku wî ji hemû hikûmetên din zêdetir kurd kuştine. Wî wek ku di maçên futbolê de pûanan radigihîne hijmara kûştiyan didan. Li gorî hijmara wan ên dawî, ji sala 2015’an heta niha 40 hezar Kurd kuştine.

Li şûna ku bi kurdan re li hev bikin û bi hev re bijîn û aştiyê pêk bînin, bi kuştina wan û tirkkirina wan wekî emrê Xwedê be,pêk anîn. Ev sed sal in ev kevneşopiya lanetkirî û zîhniyeta xwe neguherandine. Bi wan kesên ku bi dehhezaran mirov qetil kirin û li paş man, dê çawa yekîtî û wekhevî pêk were? Gotin, “Em ê gelê bê rêxistinkirî, têkçûyî û îradeya wî şikestî bixwin û têr bikin.” Ev yek anîn serê Ermenî, Suryanî û Yewnanan. Ev sed sal in li hemberî gelê kurd jî vê yekê dikin. Digotin, em ê arşîvan venekin, û rojevê biguherînin, em ê zarokên kurd ên dibistanên xwe asîmîle bikin û mejiyê wan bişûn. Bi her awayî Kurd di nava qirkirina çandî de hatin girtin. Dema ku tundî, sirgûn û komkujî lê zêde bibin, wê pêvajoya îmhayê tamam bibe.

Wêranî û êşên giran anîn serê Kurdan. Lê rûxmê wê jî teslîm nebûn. Rêber Apo, Gerîla û berxwedana gel a rêxistinkirî hemû lîstok û planên wan pûç kirin. Encama ku dixwestin bi dest nexistin. Di salên dawî de ew pir bi hêvî bûn. Gotin ku me gel tepisandiye û li Bakur kontrol û serweriya xwe avakiriye. Kesên ku tevdigerin digirin. Li cihanê tu dewlet û hêzeke ku piştgiriya kurdan bike tune. Me herêmên weke Efrîn û Serêkaniyê li Sûriyeyê dagir kir û qirkirina etnîkî pêk anî. Me li Başûrê Kurdistanê jî bi dehan baregehên leşkerî ava kirin. Me PDK’ê jî xist nava van planan. Kes napirse tu li Iraqê çi dikî û çima ewqas êriş û bombebaranan pêk tînî. Digot, em tifaqê hinekî berfîreh bikin û êrîşan xwe zêdetir bikin, em ê hem PKK’ê û hem jî gerîla tasfiye bikin Rêvebiriya Erdogan di mehên dawiyê de li dijî Kurdan koalîsyoneke cihanî ava kir. Bi mehaye bi hêzên Iraqê re hevditinan pêk tînin. Zext, tawîz û teklîf tên rêzkirin. Hevdîtin û danûstandinên bi DYA, NATO û Rûsyayê re jî zêde bûn. Hewl dide Îran û hikûmeta Sûriyê jî bike nava vê eniyê. Dît ku tenê bi hêza xwe û desteka ku heta niha girtiye nikare vê şerî bi ser bixwe. Ji bo vê jî pêwîste tevgera azadiya Kurd hîn zêdetir lawaz bike û tifaqên xwe zêde bike. Gotina “yên ku pirsgirêka kurd çareser nekin wê çareser bibin” li tirkiyê her timî rastîya xwe tê. Ji sala 2015’an û vir ve Erdogan bi tena serê xwe nikare desthilatdariyê bike. Ji bo ku Kurdan bişkîne û winda bike vebijêrka şer hilbijart. Kurdan jî li ber xwe dan û pê da winda kirin. Ev yek di hilbijartina 31’ê Adarê de careke din derket holê. Bi hêza dewletê 2 setan hemû şaredariyên HDP’ê desteser kirin. Lê gel teslîm nebû, berovajî vê yekê tûjtir bû û bi hêrs tijî bû. Di dawiyê de kurdan qayyim derxistin û hejmara şaredariyan zêde kirin. Dîsa cihên wekî Şirnex û Şemzînanê bi dengên hilbijartinê û yên leşkerî dagir kirin. Cihên wek Bedlîsê dizîn. Ger van lîstokan nebûya partiya DEM’ê wê 15 şaredariyên din jî bi dest bixistan.

Dê CHP bibe partiya pêşeng û nepejirandina gelê kurd a li dijî pêkanînên kolonyal wê faşîzma AKP-MHP’ê rawestîne? Na şer na de seknandin. Tu hêz û şiyan (yetenek) a AKP’ê nîne ku pirsgirêkên Tirkiyeyê çareser bike. Ji bo Erdogan desthiladtarî tê wateya her tiştî. Di vî warî de jî bo tepisandina rojevê, bêdengkirin û bêbandorkirina muxalefetê wê şer mezin bike. Ji ber ku heta niha CHP’ê û partiyên din li dijî şer û operasyonên dagirkeriyê yên li dijî kurdan derneketine. Ew jî bûne parçeyek ji koroya yekîtî û yekitiya netewiye. Erdogan dizane ku ev mijar aliyê wan yê herî qels e. Çawa ku tê zanîn pirsgirêka Kurd li derve aliyê herî qels yê Erdogan e, di hundir de jî weke aliyê herî qels ê mûxalefetê hate bikaranîn.

Helbet encamên hilbijartinê li derve jî tên temaşekirin. Jixwe Erdogan kesekî bêbawer û bêrûmet bû. Lê dewlet jî bo berjewendiyên xwe bi wî re kar dikirin. Niha îtîbar û hêza wî hê bêtir lawaz bûye. Li gel van hemûyan jî Erdogan naçe ser rêya aqîl û çareseriyê. Tifaqa ku bi Ergenekon û nijadperestê MHP’ê re çêkir û lawazbûna dewletên herêmê wî jî şer re nahêle. Tirkiye jî xwedan berfîrehbûn û planên berfîrehkirina sînorên xwe ye. Dema ku Rojhilata Navîn di nava krizeke wisa kûr de ye, faşizma Tirk jî dixwaze ji vê konjonkturê sûdê werbigire. Ji ber vê yekê ne hewce ye ku mirov şîroveyên xweşbîn bike. Yên li dijî faşizma Tirk in, divê hesabên xwe li gorî vê bikin.

Kodên şikandina bêdengiyê

Farûk Sakik

Di van çend salên dawî de, li Kurdistana ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ye, bêdengiyek hebû. Ev bêdengî ji aliyê herkesî ve di pencereyek cuda de hat nirxandin.

Herî dawî îlana rêveberiyên xweser û şerê bajaran a sala 2015’an sedem hat nîşandan.

Dixwestin sedemên esasî veşêrin. Bêbextî dikirin. Tevgera Azadiyê tewanbar dikirin. Lê di rastiya xwe de ser siyaset, polîtîka û planên dijmin dinixumandin.

Em vegerin desthpêka dijminatiya dewleta Tirk a li dijî Kurdan.

Sed sal berê red, înkar û asîmîlasyon dane destpêkirin. Dema li dijî vê yekê serhildan pêk dihatin, ev serhildan bi awayekî tûnd bi komkujiyan dwî dibûn. Bi salan ev bêdengî dewam kir. Bi PKK’ê û bi Rêber Apo re ev yek êdî wê wisa hêsan nebûya.

Rihek di nav civaka Kurdan de hat afirandin. Ji hemû sedemên komkujiyan de berxwedan derbasî merhaleyek din dibû. Rêber Apo, ji destpêka damezirandina PKK’ê hetanî roja me, civakê fêrî ‘dî têkoşînê de ji xwe bawer be’ kir. Digot, rêbaz û metodên zîlma dijmin çi dibe bila bibe, rêyek têkoşînê heye. Rêyek ku bêdengiyê berteref bike, heye.

Darbeya 12’ê Îlonê bêdengiya herî mezin hebû. Dixwestin Kurdan biqedînin. Lê berxwedana zindanan û çalakiya 15’ê Tebaxê têkoşîn derbasî qonaxeke nû kir. Dengê guleya 15’ê Tebaxê dewsa vê bedengiyê girt. Di salên 90’î de bi şewitandina gundan û bi êrişên kontrayan Kurdistan vala bû. Kurd derbasî metrepolan bûn. Rêber Apo midaxleyî pêvajoyê kir bi siyaseta demokratîk ev bêdengî bi dawî kir.

Piştî komploya navnetewî demeke dirêj bêdengiyek hebû. Rêber Apo dewlet raziyî hevditinên Oslo kir û piştre jî bi pêvajoya muzakereyan bêdengî bi dawî bû û Kurd di doza xwe de derbasî qonaxeke nû bûn. Piştî ku tecrîd destê pê kir û ji Rêber Apo xeber nehat girtin, Tevgera Azadiyê, Kurdan û kesên Rêber Apo nas kiribûn ji bo azadiya wî hemleyek dan destpêkirin. Ev bandoreke mezin li civaka ku ji sala 2015’an ve bêdeng maye kir.

Di demek ku herkesî digot temam evcar dijmin bi ser ket de me dît ku di 17’ê Sibatê de li Kolnê, di 8’ê Adarê de daketina jinan a qadan de, di pîrozbahiyên Newrozê de di banga milyonan de, di encamên hilbijartinên xwecihî de û herî dawî jî li Wanê di serhildana ku pêl bi pêl li Kurdistanê belav bû de, me dît, ev meşa ku Rêber Apo ji bo azadiyê dayî destpêkirin ranaweste. Hemû bêdengî demî ne û teqez wê werin şikandin.

Ev encamên li jor min rêz kirin de jî hat îspatkirin, ji Rêber Apo kontakt were qût kirin jî, di demên awarte de jî nexşerêya berxwedana wî, dikeve dewrê û encam digire. Di hilbijartinê dawî de paradigmaya wî ya siyaseta demokratîkket dewrê li Tirkiyê û li Kurdistan encam girt. Bi serkeftina vê hilbijartinê têkçûna desthilatdariya AKP’ê dan destpêkirin. Di vê hilbijartinê de heger bi stratejiya xeta sêyemîn tevnegeriyana wê CHP’ê jî ev encam negirta. Paradigmaya Rêber Apo bêdengiya civaka Tirkiyê jî berteref kir. Ji îroj şûnde jî ji bo dawî anîna vê desthiladtariyê, wê dîsa ev kodên şikandina bêdengiyê bikevin dewrê. Eniya demokrasiyê ku ji Kurd û hêzên demokrasiyê pêk tê lokomotîfa têkoşîna li dijî faşizma AKP’ê ne.

Em yelpazê piçek dinekin; Ev kodên şikandina bêdengiyê di heman demê de wê bêdengiya li hember modernîteya kapitalîst jî bişkîne. Ji niha de em wî dengê qirçeqirça ji bêdengiyê diçe, dibihîzin.